Piştî ku min tiliyên xwe baş fêrî bizqê kirin, û navê stranê min jî derketibûn, min hin şevbuhêrkê taybet lidar dixistin, li vir û li wir, dost û heval, ez nedisekinîm wek perwerdeyekê bû ji min re, vê dawiyê min nema dikarîbû bela xelkê ji xwe vekim, bû wek karê min, tê bîra min di sala-1968an de min dawetek lidar xisit 25 kaxetê sûrî dane min.

Mîrê Bizqê Se'îd Yûsiv

- Em hinekî li ser ezmûna te di nivîsandin û awazkirina helbestê de, baxivin?

Afrandin tişteke xuzayî ye, bi mirov re tê, min ji xwe re digot ez dikarim tiştê xweş binvîsim, çaxa min helbestek dinvîsand û awaz dikir, min ji cemawerekî re digot, wê çaxê min nas dikir ku çiqasî cemawer ji gotin û awazên min hes dikin, û ji 50 salî ve ez ji nivîsandina helbestê û çêkirina awazan newestiyame. Seydayê Cegerxwîn ji min re got: Çima tu helbestê min awaz nakî û nabêjî? Min got Seyda helbestê te ne yê strana ne, gote min ew raste ne yê strana ne, bi rastî ez nizanim helbesta stranî çêbikim!! Helbestvanê Kurd cudahiyê naxin di navbera helbesta "helbest" û helbesta stranî de.! Her wisa di çêkirina mûzîkê de, li Ewropayê pêşî mûzîkê çê dikin paşê gotinan jê re tînin, Hunermendê Kurd pêşî gotinan tîne û paşê jê re awazan çêdike! ew jî şaşiyeke pir mezin e! Ji ber mûzîkjen"Awaz danêr" di nav Kurdan de tune ne, ew gotinan dinvîsîn û awazan ji wan gotinan re peyda dikin. Mûzîkjen çaxa ku parçeyeke mûzîkê çêdike ji bo xelk lê guhdar bikin, di nav Kurdan de kesek tune ku parçeyên mûzîkê çêbike.. Min gelek parçê mûzîkê çêkirine, di sala2013an de, tîpa mûzîkê ya niştimanî ya sûrî 12 parçeyên mûzîkê yên min çêkirbûn bi orkêstrake mezin di mala Oppra de li Şamê lêxistin.

Em bên li ser qonaxa çûna we bo Libnanê û damezrandina Koma Newroz?

Ez wek hunermen her û her li pêşketinê digeriyam, min hêza xwe di hunerê de nas dikir, û ji ber navê Beyrûtê kirbûn "Siwêsra Rojhilat" hemû rê li ber afrêneran vekirî bûn ez çûme Beyrûtê. Ez demek xweş li wir mam, min dît ku komeke Ermeniyan heye, û baş mûzîk û dîlanan pêşkêş dike, min têkilî bi hin xortê Kurd û malbatên Kurd re kir, ku em jî komek filiklorî çê bikin, di despêkê de ez pir westiyam Kurdan nedihiştin ku keçên wan werin dîlanan bikin, ez li xortan neheyîrîm, min çend keçê Kurd anîn û 7 keçê libnanî bi mûçe dihatin kar bi me re dikirn anîn, û me kom damezrand û me navê wê kir "Koma Newroz". Ji wan keçên Kurdan min dengek bijart û min ew derxist li ser dika hunermendiyê, û navê wê derket helbet hûn hemû wê nas dikin hunermened "Şêrîn" e.
Vê dawiyê rehmetiyê Mihemed Şêxo hat Beyrûtê ew jî tevlî koma min a Newroz bû erkê wî di komê de li ser amûra bizqê bû, ne wek hunermend min ew bijart!! Me perwerdeya salekê kir heta ku me berê xwe da ku em ahengeke mezin bi sponserya serok wezîrê Libnanê Saib Selam kir, bi hezaran kesayetê navdar li wê ahengê amade bûn, rojnamegerya Libnanê bi

Hûn sê hunermendê navdar " Se'îd Yûsiv, M.Ezîz Şakir, Mihemed Şêxo" li Beyrûtê bihev re bûn, têkiliyên we bihev re çawe bûn?

xortî li ser vê ahengê sekinî, û weşand û nivîsand, navê koma min derket, û êdî em bi xortî dihatin xwestin ji bo aheneg û Festîvalan.

Mamoste Se'îd Yûsiv hinek gengeşe li ser bûyer û dîroka vê komê, û vê ahengê heya! hunermend Mehmûd Ezîz Şakir dibêje koma min bû ya ku bi sponserya serok wezîrê Libnanê aheng lidar xist?

Çaxa ku Mehmûd Ezîz Şakir hate Beyrûtê kesî ew nas nedikir wek hunermend, dixwest ku tevlî koma min bibe, lê mixabin cih di komê de tune bû, û min jî ew nas nedikir, vêca çend kes hebûn dihesidîn koma min, berê M.Ezîz Şakir dane damezrandina komekê ji bo berberya koma me bikin! Wan jî ji xwe re holek girtin û bi sponserya serok wezîr Saib Selam aheng lidar xistin, lê bi serneketin, û koma wan xerabû, û M. Ezîz Şakir hat tevlî koma min bû.

"Ez ji berê bêtir niha kar dikim, min hetanî 8 se'etan bê sekn li bizqê xistiye ez gihame asta ku kes tiliyê min nebîne"

Ji bo nebim berpisyar di ber dîrokê de Mihemed Şêxo li Libnanê ne navdar bû, û kesekî ew û M. Ezîz Şakir nas nedikirin. Mihemed Şêxo li ser bizqê bû, û amûrjenekî lawaz jî bû, çend mehan bi M.Ezîz Şakir re ma, çend stranê wî û hinek ji stranê min ezber kirin, çaxa ku ew hate Qamişlo em li Beyrûtê man, û bi wan stranan li Qamişlo wek hunermend hat naskirin û navdar bû, ku ew stran yê wî ne! Bibûrin ku ez vê gotinê bibêjim dibe ku hinek dilê xwe ji min bigrin, Mihemed Şêxo li ser hesabê stranên M.Ezîz Şakir derket û navdar bû, lê bi roleke mezin di aliyê hunerê de lîst Xwedê wî bi dilovaniya xwe şad bike. Û Mehmûd Ezîz Şakir jî li alava Ûdê dixist û miletê Kurd ji mûzîka Ûdê hez nake, loma jî ew zû navdar nebû.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

- Em li ser bijartina te ji helbest û helbestvanan re baxivin?

Mixabin, di herçar parçeyê Kurdistan de awazdaner û helbestvanê stranî kêm in! Ji ber ku helbestvanê stranî tune bûn, bê çare dimam ku ez helbesta stranî ji xwe re binvîsim, wek nimûne min ji Seydayê min amade kirine lê ka ez wan bidim kê? Mixabin û sed mixabin! Min ji gelek hunermendê ereb re awaz çêkirne, di heyamê xwe de navdar bûn. Lê vê dawiyê çirûska wan vemirî, lê ya navdar ku min jê re awaz çêkirine Semîra Tewfîq bû. Min ji bo hînbûna alava bizqê pirtûkek nivîsandiye, lê belê min çap nekiriye di wê pirtûkê

Cegerxwên re Helbesta "Gava Seher Rabû Ji Xwe" çêkir û stra, lê min jê re got helbestê te ne yê stranî ne!

- Min dixwest ez vê mijarê jî bi te re gengeşe bikim, gelo navê Qamişlo berî strana te, yan piştî strana te bû " Qamişlo Bajrê Evînê"?

Belê bi wê strana min ya navdar "Qamişlo Bajarê evînê" Navê Qamişlo bû bajarê evînê. Ez bi vî navî xwe paye dikim. Ji ber Qamişlo ji min re gelek tişt e, cihê gelek tiştan e, Kurdê Qamişlo ji Kurdê herçar parçeyên Kurdistanê çêtir in!!

- Ji bilî hunermendê Kurd, we ji hunermendê Ereban re jî awaz çêkirine, em wan di vê hevpeyvînê de nas bikin?

" Hîn min kesek nedîtiye ku ez navê xwe bidimê, ji ber ku mîrekî daye min, pêwîst e ez bidim amûrjenekî jêhatî, "

Ezmûneya min di nav hunera Ereban de, sûd da min, ez li ber destê mamoste Ferîd Xusin mamostayê Ferîd Altreş bû fêrî gelek bingihê mûzîkê bûm, ji bo awazan carekê ji Ferîd Altreş pirsîn hûn ji çi ditirsin? Gote wan ez ditirsim ku zû bimrim û bi sedan awaz di serê min de hene û nehatine tomarkirin!? Ez jî niha vê dibêjim bi hezaran awaz min çêkirine û de min 12 parçeyên mûzîkê afrandine, hin ji wan parçeyan mûzîkjenê Libnanî yê navdar Ziyad Rehbanî dîtin, û ew 12 parçe bi orkêstrake mezin çêkirine û li rex xwe hilandine. Û di hevpeyvîneke xwe de Ziyad Rehbanî gotiye Se'îd Yûsiv amûrjenekî gerdûnî ye.

- Em li ser navê te wek Mîrê alava bizqê di gerdûnê, piştî ku mîrê berê Mihemed Ebdulkerîm da te baxivin, hûnê piştî temenekî dirêj vî navî bidin kê?!

Ez ji navan hes nakim, helbet bi vî navî pir şanaz im, ji xwe wek her kes dizane ku Mîrê bizqî yê berê Mihemed Ebdulkerîm bi min vekiriye, helbet wî dît ku ez çiqasî pspor û şaraza me di lêxistina alava bizqê de lê wek ez niha mîrê bizqê me qet mafê min negha ye min ji ber ku 12 dîwanê min hene û ez nikarim wan çap bikim- Ka mîrîtiya min- Min bêtirî 1000 stranî çêkiriye, pêwîst e ku ez tomarkirna gelek stranan ji wan nû bikim hemû tişt hene û kes nabêje ez amade me, ew bixwe dilê min bi min naşewite lê dilê min bi wan stranan ve maye ku hîn wek tomara berî 30-40 salî mane, yê ku dixwaze vê bangê guhdar bike dikar têkiliyan bi min re bike!! Ya ku ez ê vî navî bidim kê, hîn min kesek nedîtiye ku ez navê xwe bidimê, ji ber ku mîrekî daye min, pêwîst ez bidim amûrjenekî jêhatî, hîn min ew nedîtiye, tevî ku kurê min Zoro ji %70 ji min biriye, lê nikarim vî navî bidmê, dibe ku hin hebin hîn min ew nas nekiribin!

- Hûn rojê çiqasî li amûra bizqê dixin?

Ez ji berê bêtir niha kar dikim, min hetanî 8 se'etan bê sekn li bizqê xistiye ez gihame asta ku kes tiliyê min nebîne..!!

- Gelo hunermendê Kurd di riya huner û mûzîkê de karîbû debora jiyana xwe bike?

Mixabin, na! Hunermendê Kurd diçe ber dilovaniya Xwedê û sed hesret di dilê wan de dimîne, min serdana Hunermendê navdar Hesen Cezrawî kirm kursî nebû ez li ser rûnim, wisa di serdana Mihemed Arif Cizrawî cilikek nebû ku mihvanê wî li ser rûnin, piştî ku dimrin ji nû holan bi navê wan ava dikin

- Gelo pêvajoya hunera Se'îd Yûsiv bûye dibistan, û şagirtên vê dibistanê çêbûne?

Ez naxwazim vê bêjim, lê bi hezaran kes hene rêya mûzîka min şopandina, û staîylê min bijartine.

- Ji bo vê kirîza dijawar ku di Sûriyê de qewimî û vêket, we çi ji gelê sûrî û gelê Kurd re çêkiriye?

Ez di vî şerê dijawar de stranê çê nakim, ez ê ji bo aştiye tenê stranê çê bikim û bêjim.

- We çend stran hetanî vê axeftinê çêkirine?

Min nêzî 1000 stranî tomar kiriye. Tiştek nemaye ku min stran ji bo wê bûyerê yan wê mijarê çênekirye!

- Niha di vî heyamî de hunermend albomek xwe derdixe dibe ku tenê stranek jê navdar dibe, ne wek heyamê we û albomê we hemû stranê albomên we navdar dibûn, sedem çine gelo?

Ji ber ku piraniya albomên ku derdikevin mîna hev in, di abomekê de 8 stran hene wek hev in, dişibin hev, cudahî tune ne, rengan nadin helbest û mûzîkê, gotinek min heye ez tim dibêjim: Hinek hene huner li wan bûye bela, û hinek hene ew li hunerê bûne bela!!.

- Çaxa hûn tenê bin, hûn li kê guhdar dikn?

Ku bixwazim li dengan guhdar bikim tenê li Miradê Kinê, û Mihemed Arif Cizrawî guhdar dikim.

- Hûn poşman bûne ku we riya hunerê bijartiye?

Huner tiştekî pîroz e, xweş e, lê mixabin wek dilê min nebû, û neqeda.. lê ne poşman im.

Şîreta mîrê Bizqê ji nifşê nû re?

Di serî de pêwîst e ew bi awakî zanistî xwe hînê çanda huner û mûzîkjeniyê bikin, xwe ji kultûr û filikora xwe dûr nekin, nabe ku ew dûrî wan herin, giringe ku ji xwe re stîlekî taybet bixwe çîbike

- Hatinek we ji bo Rojava heye?

Helbet dibe ku ez werim.

- Heger hûn hatin hûnê vastîvalan lidar bixin?

Helbet ku ez hatim, ez ê fastîvalan lidar bixim, û amade me jî.



Gotina dawî:

Silavê min ji Qamişloka Evînê re hene, ez axa Qamişlo maç dikim, ji hemû hezkiriyê xwe re silavan dişînim her û her hûn serkeftî bin. Ez birayê we Se'îd Yûsiv im.



www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Kurd Di Azmûnekê Nû De Ne



Kurd ew miletê li ser xaka bav û kalên xwe dijîn, her tim xwe li hember hêzên dijwar dibînin, hêzên ku dixwazin wan ji kokê bibirin, lê berxwedana vî miletê zindî gelek rûpelên gulgulî ji dîrokê bi xwîna xwe a pîroz hatin xemilandin.

Dîrok: Ku mirov bi nêrîneke hûrbîn li jiyana Kurd ên berî sedên salan binere wê tekez bike bê çiqas talan û xopan hatiye serê wan û xaka wan bûye tabloyeke ji xwîn û hestiyan, çimkî neyaran tim gemş û şerên xwe li ser wê xakê çê kirine da baca mezin Kurd bidin û tim jar, perîşanî, kuştin û wêran para wan be.

Bobelat û malwêraniya hatiye serê miletê Kurd ku serkirdeyên wî bi berpirsyariyeke temîz tê de biramiyane wê her çend salan dîse ew jankêşan bi awayekî din nehatibane serê wî, lê mixabin tim van serkirdeyan xwe dîlê nêrînên teng çi olî bin yan bercewendiyên kesayetî bin dîtiye. Ne halo tenê jî, ya ji vê mestir ew e ku her hêzeke Kurd an berçavka neyêr dide ber çavên xwe û li birayên xwe dinêre weke dijmin ne weke piştgir û hevparê biryar û hebûnê!!!!!

Xwenasîn: Xwendina dîrokê bi tivingê tenê tekûz nabe, çimko hatiye zanîn ku serkeftinên Kurd an di qadên şer de li ser mêza hevpeyvînan têk diçin, ev yek çi pêwîst ji rewşa me re destnîşan dike? Ger ew ne yekrêzî û yekîtî be wê çi be? Min ew hêvî ji serkirde nedikir halo girêdayî bi dagîrkeran ve derkeve. Qey naxwe em evqas sal hatibûn xapandin! Yekî dilşewatê Kurd iyetiyê wisa di ber xwe de digot û hêsirên wî simbêlên wî şil kiribûn. Ev tracîdiya bê bext ne ji bo Kurd an bi tenê hatiye , lê ma gelo hêvî heye em guhertinê bikin rêveçûna jiyanê?

Pirojeyên REŞ: Pirojeyên hene tev de li dor xwena welatê rojê, welatê zîv û zêran, welatê gencîna petrol û şûnwarê şarestaniyên xwedan rol di hebûna mirovaniyê de. Hemû piroje xwe vediguherin lê armanca tevan ew e ku dagîkirina xwe bi çi awayî be li ser vê xaka pîroz bidomînin, her çar dewletên Kurdistan li xwe hevbeş kirine di bin mêza kîn û çavsoriyê de li hev dicivin û dixwezin hin ji hêzên Kurd an bi nerîna xwe ya ku ew lîstika bi mejiyê me yê Kurd ê dîndar û olperest, çawa Îran bi alîkariya Îraq û Sûryê dixwaze karîdoreke Şîe çê bike û Kurdistanê biqelêşe û Kurd an bi xwe jî ji hev parçe bike, lê nayê jibîrkirin ew şofena bi nav olperest çawa bi sedan xort qîzên Kurd an bi darve dike li Kurdistana Rojhilat û li Kurdistana Basûr jî tim koleyên xwe dixapîne bi navê şîeyetê û navûdendên pûç û vala.

Tirkî jî dev bixwîn e, sed hezar ferman derheqê Kurdan derxistine û bi hezaran gund talan kirine û niha bajaran jî wilo xopan dike, ji bilî ku jimarên pir mezin ev sedên salane ji Kurdan kuştine û hîn dikuje û di van rojên bûrî de bi sedanan xortên zana û endamên perleman yên Kurd girtine û binçav kirine, herçende Ardogan dibêje ku Kurdistan li Çînê çê bibe ez dijî wê me!

TEV-DEM: Cihê razemendiya her kesekî ye gava rêz ji dengê milet re hebe, bi çi rengî be bila bibe, ya giring ew e milet xwedî nûner be, çi di hikimdariya tar û bajaran de û çi di perleman de, û ya herî baş jî ku ev system bihna têveliya milet jê were ne ya rêxistinke bi tenê. Ev gotin rastiya xwe ji bo rêbaza nivîsandina pirtûkên dibistan, institutî û kolîjan re pir lihevhatî ye. Ji aliyê konevanî ve jî xurtkirina aniya hundir pir pêwist e û rengek ji yekrêziyê, nemaze di van nîrên dijwar de, di nav hêzên sereke de hebe, weke nimûne di nav TEV-DEM û ENKSê de, û yên mayî nêzî wê ne bêhtir . Kesek bêyî fermaneke dadgehê neyê girtin û kesek hate girtin divyabû piştî du rojan bê dadgehkirin, ji xwe girtiyên nêrînan û rojnamevan çênabe bên girtin ji bo karên xwe.

ENKS: Bi hûrbînî li ser endametiya xwe di kuwalatisyonê de rawest çimkî ev opozesyon mîna kevoka qelab e, her yek ji endamên wê derbarî mijara Kurd î nerîneke reştir ji yê din eşkere dike û gelek caran jî pelikên ku imzekirine vedigere....bext ji opozesyona Sûrî re nîn e.

Ya herî giring ku her du hêzên sereke di bin masê de lihevhatineke rasteqîn ji bo bercewendiya milet hebe .

Rewşa Deverên Kurdî û Giringiya Demê



Piştî ku rewşa Sûriya ber bi xirabûnê ve çû, û ji encamên şoreşa wê, li her deverî rewş tev li hev bû, bi teybet li deverên Kurdan. Dema ku merov lê dinere, pir zorî lê peyde bûye, deverên me ber bi valahiyê ve ji hemwelatiyan diçe, ber bi guhertina dêmografiyê diçe, dema em li ser giringiya wê rawestin bê çi çareserî jê re pêwîst e. ji hawîrdor dewletên derdor, ku naxwazin tu başî li nav Kurdan pêk were, lewma bi her şêweyî li dijî tevgera me disekinin û destê xwe dirêjî nav welat dikin, ji hêla din ve dewletên navnetewî û bi teybet dewleta Emerîka û Rûssiya dixwazin ligel hêzên me alîkar bin. Tevlu ku ji destpêkê ve, dewleta Turkiya bi himeta recîma AKP destê xwe yek ser dirêjî nav dijberya Sûriya kir û ew bê hêz kirin, lewma rewş ber bi xirabiyê ve çû, û pir tevluhevî peyde bû.

Ji encamên vê yekê hêzên tarî yên xwediyê tirorê xwe pir bi hêz kirin û dewleta bi navê ya Islamî li Îraqê û Sûriya bi nav kirin û bûne bela serê gelê Kurd, ku dijminê gelê Kurd wan li dijî Kurdan li Başûr û Rojava bi kar tênin, êrîş bi êrîş li dijî Kurdan bi kar tênin. Ev rewş ber bi Asta navnetewî berz dibe, di deverên me de berevanî berfereh û bi hêz dibe, alîkariya navnetewî bi xurtî pêşkêşî hêzên Kurdî li Başûr û Rojavayê Kurdistan dibin. Hevpeymana navnetewî bi belafirên xwe piştevaniya hêzên me dikin, lewma diyar e ku ev berevaniya li dijî hêza Terora reş ji berjewendiyên dewletên navnetewî ne, êsta bihtir xurt dibe.

Di vê dema nazik de, girêdayî hilbijartinên serokatiya Yekîtiya Neteweyên Emerîka, ku kandîdê herdu Partiyan bal dikişandin ser piştgîriya Kurdan, û bi teybet yê rêpublîkana "Donald Tramp" vêca piştî ku bi ser ket û bo serokatiya Emerîka hate hilbijartin got ku pêwîst x e bi xurtî emê alîkariya Kurdan bikin, bi behweriya wan Kurd xurt tirîn hêzin, bo Emerîka yê li dijî Hêza Terorê , hêvî xurte ku bi Kurdan re hem li Başûr û hem li Rojava piştgîr be, ew bi xwe weke kes wê ne wissa bi tenê xwedî biryar be, lê wê partiya wî bi gelemperî piştgîr be bo wî û li gor berjewendiyên dewleta Emerîka wê alîkariya hêzên Kurdî bikin, belkî bi serokatiya wî bihtir ji ya serok Obama be.

Tevgera Kurd jî weke ku merov dibîne ne li ser heve, yekrêziya rêzanî ne li ber dest e, lewma pêwistiya me pê heye, ku merov karibe rê li ber nakokiyan bigire. Ez dikarim bêjim ku seredana herdu siyasetmedarên Ewropî û Emerîkî, wezîrê karê derve yê berê, ê Ferensa Koşnêr û Balyozê berê yê Emerîka li Kiroatiya Kalbrîs bo "Sêmalka" û hevdîtina wan li gel berpirsên Rêveberiya Xweser, girêdayî pirsa hevkarî û rewşa rêzanî bi tevayî li welat. Dibe ku xaleke giring jî ew be bo lihev anîna hêzên tevgera Kurd û çareserî bo bi dawî anîna nakokiyan.

Ji bo ku ev xal hemî bi cih werin û bi rêk û pêk pêş ve herin, barekî pir giran e, nexasma ku em ketine rewşek zor xirab de, rewşa aborî, asayî, rêzanî û zanistî di qunaxeke zor ve derbas dibin, û êrîşên hêzên tirora reş xurt dibin û ziyanê digihênin welatê me.

Dema em hemî destê xwe bidin hev li ser bingeheke rast û destê alîkariyê ku ber bi me dirêje bigirin û bo berjewendiyên xwe bi kar bênin, hêviya serkevtinê xurt dike ku azadiyê û rezgariyê bi dest bixin.

Gelo ew amadekarî li ba hêzên tevgera me heye, ku bikarin roleke sereke di deverên me Kurdan de bileyizin û serkêşiya karê pêşerojê bikin. Li vir diyare li gor seredana Koşnêr û Kalbrîs ku pêwîst e ev lihevhatin giring e û ya dawî bê wê nabe, em bi hêvî ne ku êdî di zûtirîn kat de, ev daxwaz bi cih were û li ber barê giringiyê rabin. Dema ku berjewendiyên gel û welat di ser yê partayetî û kesayetî re bigirin, qet ne zore ku vegerin hevpeymanên Hewlêr 1 û 2 û Dihok û li hev hatinek giştî bi kar were, û dest bi dest ligel hêzên navnetewî kar bikin, armancên gel bi cih werin.

Gerek Ez Niha Li Festîvala Şano Ya Amedê Bama



Wekû her sal, di vê demê de ji salê ez li paytexta Kurdistan Amedê bûm, da ku beşdarî fastîvala Şanoya Kurdî li wir bibim..

Îsal jî hatibû plankirin ku ez bi semînerekê derbarê hunera Şano û qonaxên ku têre ev huner derbas bû li Rojavayê Kurdistanê, derbarê zehmetî û aloziyan û derbarê rewşa Şano di serdema şoreşa Rojava de ji xelkê Amedê re biaxivim.

Bi rastî ez bibêjim, yek ji wan saetên herî xweş di jiyana min de ye dema ku dibim mêvanê festîvalên Şano, lê herî xweş jî dema ku ew festîval li Amedê be.

Di van festîvalan de ez nêzî hunera ku ez jê hezdikim dibim, rojane çend caran şano bi Kurdî zindî temaşe dikim û piştî şano jî bi şanogeran re dikevim nava gengeşe û rexnekirinê de û bi vê xebatê em hemû jî li pêş dikevin û bi vê pêşketinê re em asoyên nû ji pêşeroja vê hunerê re dinava gelê Kurd de dibînin û bi taybet bi hewildanên ciwanan re dema ku bi bi gaveke fedyok tevlê dibin.

Ev wisa plankirî bû lê nebû..

Çima nebû jî sedema wê ji tevahiya dunyayê re xuyaye..

Îsal dewleta şoven a Tirk nehişt ku karên şaredariyê bi rêve here, şaredar girtin, gelek xebatkar ku girtina şaredaran pirotesto kirin ew jî girtin û hevalên ku me dixwest em wana li ber ronahiya sehnê bibînin, bûn mêvanê zinadanên tarî ku qet li bejn û bala wan nayê.

Dewleta Tirk îsal ne wekû ti caran, lê di heman demê de wekû her car, riwê xwe yê reş bê şerm û fedî derxist û bi awayekî herî qirêj hemû tevgera xwe û plana xwe li ser dijberiya miletê Kurd ava kir.

Dewleta Tirk ji dema ku Erdogan bû serokwezîr û ew palana ji nû ve avakirina imperatoriya xwe ya têkçûyî dike, Erdogan ku demekê qedexe bû û di zindanê de bû, dikarî bi şêweyekî gelekî bêbext bi hemû aliyên ku jêre pêwîst bûn têkiliyan ava bike da ku li ser pişta wan bighêje armancên xwe.

Erdogan li ser hemû benan lîst û bi hemû kesî re ket nava peyman û hevbendiyan de û hemû aliyên van peymanan ceriban, dema ku dît ku ne ji bercewendiyên wî ye hema lê qulipî.

Erdogan bi Rûsya, Israîl, Îran û Kurdan re kete nava peymanan, pêşî bi Rûsan re piştî ketina balafira wan di nava wan de bû dijminatî.

Bi Israîl re piştî têkiliya wan û Tirkî a salan bi wan re jî têkiliya xwe birî û qaşo di ser Filestînan re tê nema bi wanre da û stand.

Îran ji xwe dijminê dîrokî bû ji serdema Sefewî û Osmaniyan ve, lê dîsa jî bê fedî Erdogan di serdema plana xwe ya nû de pêre li hev hat, ne ji ber ti tiştî lê ji bo ku pişta xwe vekirî nehêle di şerê xwe yê ku amade dike de.

Erdogan di sala 2013 an de bi insyatîva rêberê Kurd Ebdulah Ocalan, planek ji bo aştiyê qebûl kir.

Lê di wê serdemê de Erdogan bala xwe da peymana bi Kurdan re, ka wê çi bi xwere bîne.

Ewî texmîn dikir, digot an wê Gerîlla çek deyne, an jî wê miletê Kurd ji wanre bêje ewqase şer wê dawiyê aştî qebûl kir, û wê ji dû wan veger.

Lê herdû jî nebûn, wan gerîlla ji nava bajaran kişanndin, lê ji çiyê danaxestin, miletê Kurd jî ji wan re got em di şer de û di aştiyê de jî li pişt we ne.

Erdogan dereng û piştî serkeftina Kobanê fêm kir ku Ocalan ji girtîgeha xwe neqşa herêmê diresimîne û ji ber wê jî nema zanîbû çawa li wê peymanê biqulipe.

Ocalan dema ku ew peyman bi Tirkî re li darxist wî bêtir dixwest ku gelê Kurd bi Rojavare mijûl bibe, û wisa bû..

Di nava salên 2013 û 2014 an de Rojava gavên mazin avêtin û şoreşa ciwan xwe li ser lingên xwe girt.

Artêş hate avakirin û ev artêş ji qonaxa xweparastinê ket rewşa êrîş û rizgarkirinê.

Di dema ku Kobanê bû mijara cîhanê û koalisyona navnetewî ket nava şer de û bû alîkar ji Kurdan re, Erdogan mîna miriyê ku serê wî li kevirê gorê bikeve bi xwe hisiya bê çi şaşiyek mezin kiriye.

Heya ku Erdogan bi xwe hisiya dît ku hema bêje Kurdan dewlet ava kirine û seranserê sînorê bi Rojavare ala kurdan li ba dibe.

Erdogan bi rengekî li peymana xwe qulipî ku her tişt ser û binî hev kir, di nava ciwanan de li Sirûcê teqîn çêkir û ciwanên Kurd têde kuştin û xwedê gravî ku Partiya karkerên Kurdistanê ev teqîn kiriye û careke din dest bi şerê li dijî wan kir.

Li derveyî şerê leşkerî, Erdogan dît ku di dema aştiyê de Kurdan li bakur jî dewletek ava kiriye, tenê Tirkî bi nav li bakur mayê lê kurdan her tişt xistiye bin kontrola xwe de, vê carê naskir ku şerê leşkerî li dijî Kurdan têrê nake û wan tune nake.

Ji bo cara yekem li Tirkyê ewqase palamenter niha di hebsên Tirkyê de ne, ji bo cara yekem li Tirkî şaredarên ku hatine hilbijartin ji alî gel ve hatin rakirin û endamên AKP li şûna wan şaredaran hatin bicih kirin..

Erdogan bi Rûsya re li hev hat, bi Israîl re li hev hat bi Îranê re li hev hat û bi Ewropa re peymana li ser tehdîda bi şandina koçberan re li darxist û hemû hêza xwe da hundir.

Ji ber van kiryaraên wî jî ez niha li şûna ku bi şanogerên Amedê re li ser sehnê buma, ez li ber nûçeyan rûniştîme dişopînim li bendê me ku dunya li hember van kiryaran bê deng nemîne.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestin Bijartî.. Hozanê Girkundê

Di sala 1977an, li gundê Girkundê jidayik bûye, di sala 1986an de dest bi nivîsandina helbestê kir ,di wê ,demê de têkilyên xwe bi helbestvan Xemgînê Remo re çêkir û piştî wê têkilî bi Seydayê Tîrêjre, Salihê Heydore , Ferhadê Içmo, û Arşevê Oskanre re kir

Dîrok

Dîrok xewnedar e,
bo ji nû ve bi şewla
Berbangê,
xwe bike dildarê jînê,
bo çîrokek nûjen
li bejna hêviyan diyarke
û jibîr bike, êşên li birînê…
Dîrok daxwazdar e,
ku riwê salên rûreş,
bi qevdên gotinan,
li ser tevna bê dengiyê
raxînêêê.
Dîrok demijmêra
girtiyekî
diljar, li asoyên rûpelên
riziyayî,
hêdî hêdî dixwînêêêê.
Dîrok mîna destar e,
bûyerên mirovahiyê,
Omîdên penaberan,
peyama şoreşgeran,
bi ximaviya pênûsê
vedijînêêêê.
Dîrok wiha ye.

HÊVÎ

Hêvî û xewn:
Di çihrên çavên te de,
winda bûn,
ji ber
çavên te, ji hêvî
û xewnan
dûrtirin,
vîn û evîn,
di daristana pore te de,
avjeniyê dikin
û şepola didin
kenarê dil.
Axîn û kovan,
konê xwe pêçan
û bar kirin,
ji dema rûkê teyî
berfîn.
Şewl da tariya min,
lê ji hinga
min te nasî,
ti bû çivîkek
baskokirî
û hêlîna xwe,
li peravê kaniya
Evîna min
Çêkir..çêkir.

JI SIRÛŞA PEYAMA TE

Welatekî sitembar,
kirasê bindestiyê
li xwe zîvar zîvar
kir û ber bi asoyekî
winda, hêdî hêdî
hilkişiya, belkî dikaribe
li wê derê, bihnek
ji azadiyê, li ser
rûpelên dîroka
mirovahiyê, wajo bike
û biafirîne...
Welatek ji demek dirêj,
govenda bûyeran
saz dike,
li pênas û navê xwe
digere,
Di nêv mija nîgaşên
xwenade,
dibe mîna rewrewka
leylanê,
li pê dûmana hêviyan
tîdar dimîne,
Welatekî xwedî
ziman û tor,
qad û dîrok,
hînê wisa ji sawa
çewsandinê
ditirsêêêê,
ku razên veşirtî
ji bin tevna salên pîr
derînêêêêê.
Ev peyama hebûnêêêê
hînê çavên xwe
li xwendevanekî evîndar
digerînêêêê…

Di gelek kovarên kurdî de mîna kovara Zanîn ,Zevî ,Buhar ,Pirs ,Jîn ,Gazî, Rewşen ,Welat, Riya Gel , Ronahî, Xebat , Sorgul ,û di gelek malperan de mîna Welatî, Efrîn , ,Amûde de helbestên xwe weşandine.

NEYJENA MIRINÊ

Dergehên kevneperestiyê
dîsa li pêşiya
elenda xewnan vekirin,
semawenda sembolên
tinebûnê bi dîwarên
hovîtiyê daliqandin,
bi xemaviya reşahiyê,
tîpên mirinê nivîsandin.
Li ser ciwaniya sînga te
Wajo kirin.
Qamişloka ku hînê
ji meya serxweşiyê
hişyar nebûye.
Vaye dîsa peyala
axîn û kesran
bi ser bejna te yî
sipîndar dakirin,
kolanên ku hînê
ji sawa mirinê
dilerizin û careke dî
bi kûranî neyjena xwe
lidar xistin
û çend gulên şengewîn
ji bejna jiyanê
weşandin.
Kenê sibehan ji ser
lêvên mindalan
vemirandin.
Ta kengî tê wilo bimînî.
Cirîda bahozên payizê
li deşta beyarên te,
di yek govendê de,
Sema dikin.
Çîroka te bûye efsane,
temenê salan bi teşîya
rewrewka leylanê
dirêse.
Tu bûyî evînek bê dawî,
evîna ku îroj bi dilopên
xwînê ji bin lingê
firiştiyê dojehê
tê vejandin...
Belê dilrevînê..
bê çend evîndar
di mihraba te de,
ji bo şengewîna
çavên te, li mêj dikin
qet dil sar nebî.
Dilgirtiyên te
nabin felat ji eşqa te,
wê bimînin lehengê
pêvajoya peyama
vekirî, wê destarê
jiyanê bigerînin
û çirayên vîndariyê
di zayina
Serxwebûnê de,
wê pêxînin
wê pêxînin

TE

Te raman li hev gerand
tovên
hêvî û xewnan
di asîmanê
sawirên min de çand.
Te min di ferhenga
tenahiyê de, biland
Te berê min da riya çûn
û nehatinê…
Wax li minê…
Te ajotim
şikefta xeman
di dil de, man
keser û jan
û laşê bê giyan
di bendewariya
te de, dilerize..
Kulîlk berên xwe
ji buharê dihêrin
dipengizin..
Bilbil ji daran dûr
dikevin
hêlînên xwe
wêran dikin
û berê xwe didin
jiyaneke din,
diherkin
û hînê dimînim
çav li rîya te,
di xewnan de, tu
mêvan û
di şevan de,
tu stêrîasîman î..
Di vînê de
pêxemberî him
xwedanî..
Di serxweşiyê de,
Tu meyvan î.
Di dînbûnê de,
di tîbûnê de,
melevanî..
Di comerdiyê de,
diperite!
Lehî diherike,
diterike
şermî konê xwe
bar dike…
Keleha Dimdimê1
xwe ji bo
lîstika maçan
û xapandina şevan
saz dike
û lêv
hevdû dişewtînin…!

ERÊ CANÊ

pênc sal çûn
ez hîna bêriya te
dikim.
Bêriya kenê te
dikim,



Niha wekî pêşkêşvan di radyoya Waşokanî bernameya Dengê Hunerê pêşkêş dike. Herweha di gelek komên filiklorî de jî mîna koma Ronahî, Mîtan, Xanê, û şehîd welat kar kiriye.

bêriya çavên
tey xumalî dikim.
Pênc sal çûn,
ez hînê di nêv mija
bîranînan de,
xulmaş dibim,
di ber banga
sorahiya
dêmên te yên sorgulî de,
şiyar dibim
û xewnên ser
jêkirî min dixapînin.
Pênc sal çûn,
me dest ji hev berda,
em ketin qeyd û benda
û kerwanê hêviyan me
bi rê kir.
Ji nû ve dergehên
xeman vebûn,
sibehên evîniyê
bar kirin,
êvarên xemgîn
xwe diyar kirin…
Pênc sal çûn
û hîn jî tu
ji hişê min ne çûyî
û wêneyên te xwe ji ber
çavên min
ne dane alî.
Bihna tey evînî,
mîna meyê ye,
min ji hişyarî dixîne…
Pênc sal çûn
hînê gîyanê min di
jîyana te de
dijî
û hêviyên min
kelogirî dibin,
li pê dûmana rojan
mişixtî dibin,
rûsar dibin,
pênc sal çûn….

JI MIN

Ez hîn di wê hûrdema
Dîdarî de,dijîm
û pêjna teyî mêşinî,
kolan bi kolan,
dever bi dever,
di quncikan de,
li min digere,
her ku xwe amede
dikim
ku bar bikim,
lê dikim û nakim
şevbihêrkên te,
girnejînên te,
ji bîra bikim…
Hevokên ku
diweşiyan
ji lêvên te
û awirên te, min
dixwarin,
ji hişê min cûda nabin
û şewşena mêbûna te,
evîna teyî agirinî,
ji vî dilê xemgîn
der nakim…
Belê dilberê di xewna
te de,
xulmaş dibim
û di lîstika dilê
te de, zarokim
bê çar dibim…
Baş dizanim,
dîdariya te, girî
û kenê te neçarin,
lê ez hîn di hêviyê de,
xwe razî dikim..
û ji sawêran, çavên
te dûr nakim…
Tu him tembûr û sazî,
ji min re xweş awazî,
bêyî te bi jînê
çawa bikim…
Bendewarî axîn û azarî,
girî û şînî,
şiyarî di dûriyate de
sar nakim…
Asîman dîn e,
qad bihar lerizîne,
belê dûriyate kul e,
qeder êş e
axîn û kîn e…

JIYAN

Arvejîna derdan,
di dilê min de, derbûne
rûpelên jiyana min
rizîyane…
Ma ez ê çi ji van
rûpelên riziyayî
ji te re, bixwînim..?!
Hêviyên min
perçe perçe
bûne…
Ma ez ê çawa evan perçên
Belavkirî, bi ser hev dû de
Bînim…?!
Evîna min li gemiya
xeman siwar bûye
û ber bi jîneke din
penaber bûye…
Ma gelo
dilê min wê dikaribe,
evîneke din xwedî bike
û kulîlkên xemgîn



bikenîne…!!?

XEMLA ROJAVA

Azad bûm ji bonaçavên te,
ji bona bejna te…
Azad bûm ji bo hemî kolanên te,
ji bo hemî xewnên te…
Azad bûm, bela bûm,
li nêv hemî deverû bajarên te.
Li Dêrikê min tovên
hêviyan çandin,
bi dilgermî…
Minbedena ala te himbêzkir
û li asîmanê vîna te,
min li ba kir…
Li Tirbesipiyê;
min çavên te,
bi kilê serxwebûnê, kil kirin
û sirûda hebûna te,
min saz kir…
Li Qamişlo;
min dergûşa evîna te hejand
û destana çîroka te,
min xwend
û lorand, helbestên
Cegerxwîn û dengê
Mihemed Şêxo,
di mehraba te de,
min bi warkirin...
Li Amûdê;

Di gelek mehrecanên helbestê de beşdar bûye, û sitran dane gelek hunermendan mîna Hisên Salih, Hemîd Silêman, Xidir Silêman, Şêrîn Salih, Muntesir Salih, Mihemed Şêxmûs, Nûrî Elî, û Rûbar Hiso.

min giyanê zarokên sînema şewitî,
ji nû ve, min bi can kir...
Li Dirbêsiyê;
min sînga te,
bi stiranên şoreşê xemiland,
ji êşên Kevin,
min derman kir,
Li Serê Kaniyê;
min xaka tebi xwîna pakrewanan
ji destên neyaran,
min rizgar kir…
Li Kobanê;
min bûka azadiyê xêlî kir,
min kişwara setemêvherifand,
ji hev tar û mar kir…
Li Efrînê;
min buhara tevejand,
min darên zeytûna
li hev civandin..
û kirasekî nû li te kir,
min diyar kir,
Azad bûm
Azad bûm

ORHAN

Bi navê te,
zemîn dilorîne,
êşên welatê min.
Bi navê te…
Refên xewnê min,
di himbêza şevê de dilûsin,
Bi navê te…
Hemî razên windayî,
xwe ji bin tevna
rojên riziyayî vedijînin,
Bi navê te…
Tenê çend hêviyên kelogirî,
di dîroka jiyanê de,
di hêlana gerdûnê de, dihejîne
Bi navê te…
Stêrkên mizgîniya azadiyê,
ezmanê eşqa min ronî dikin,
Bi navê te…
Demsalên buharî,
bedewbûna
kêfa serxwebûnê, diafirînin
Bi navê te…

Brhemên wî yên çapkirî ev in:
Evîna Vejandî 1997an.
Payiz Daristanan Diweşînin 1999an
Vehêsînek Li Ber Delavên Çavên Diberê 2006
Bihnek Ji Surişa Peyama Te li ber çapê ye.
Helbestnî bijartî ji kurdî wergerandî ne Erebî, nivîskar Tewfîq El-husynî. niha wekî rêveber di navenda çand û hunera Waşokanî de kar dike , û endamê biroya desteya çandê ye li bajarê Serê Kaniyê

Xeyala min,
bedena min,
kirasê tariyê ji xwe datîne..
û Bi navê te,
her tişt di govenda bajarê Serê Kaniyê de
sema dike;

KOBANÊ

Kobanê wargeha egîdan,
hêviya Dijla û Şîlanan,
hêlîna Edhem û Fîrasan,
kişwara Sadiq û şehîdan,
tu kes nikare vîna dilête
bişkîne…
Tu kes nikare finda
xweşikbûna te ,di asoyên
tariyê de, vemrîne ...
Kobanê bûka Rojava..
xwedana serhildan
û berxwedanê,
ey sirûda pêşerojê ...
Kobanê vaye xaka te,
bi xwîna pakrewanan,
evîneke netewî ,di hizrên
gel de, diafirîne ...
Kirasê azadiyê li bejna
Deşta Suricê û Meşte Nûrê
dikin ..Kobanê tu bûyî
destana dilê dîrokê,
tu bûyî dengê Baqî Xido
û helbesta li ser zimanan ...
Tu bûyî xewna nîgaşa
Perweran û şorişvanan ...
Ma kî dikare,
hebûnate, di hundirê
kina xwe de, biçewisîne..
û tune bike..
û paytexta mêraniya te,
di zikê tires de, veşêre
û bilerzîne ...
Roj ji bo te bê tebat in
û şev di axîna te de,
dilsar in, bi azar in..
bê xew dimînin ...
Ne nervîn û ne ti hêz dikarin,
di nêv çeperên hovitiyê de,
te dîl bikin ...
Yan arvejîna di nava te de,
rawestînin ...
Kobanê; bila çavên te
poşmaniyê himbêz neke..
û qet hêsiran tu nebarînî,
bila xemgînî kêfa serxwebûnê
ji te nerevîne ...
Vane şervanên te,
gemiya rizgariyê,
bi şewla berbangê,
xêlî dikin Kobanê.. Kobanê…

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Hunermend Ciwanê Amûdê Agirê Sînemê Bi Straneke Nû Bi bîr Tîne

Ji gotinê helbestvan Hekîm Sefqan û awazên mamoste Enwer Bavê Rewan û bi alîkariya komeke zarok, hunermend Ciwanê Amûdê kilîpeke nû li ser Agirê Sînema Amûdê amade kir.

Ciwanê Amûdê ji rojnameya Bûyerpress re diyar kir ku karê xwe bi alîkariya Bavê Rewan wek awazjen û helbestvan Ebdiselam Xoce wek helbestvan berdewam dike. Û got ev kilîp bi boneya pêncî û şeşemîn a salvegera agirê Sînema Amûdê hat, min bi awayekî hêsan û sivik li ser kar kiriye ji ber behsa zarok û êşa wan dike."

Ciwan berdewam kir:" Me tu alîkarî ji tu aliyan wernegirtiye ji ber ku kilîp li ser zarokan e, hemû bi erkên kesayetî bû, û bi alîkariya kesên dilêş mîna Bavê Rewan, Ciwan Şihab , Hecî "Jîn", tîma tomarkirinê, gîtarjen Amir Hesen, ûdjen Ehmed Şiweyix, û kemanjen Rewan Ebdilrehman bû.. Di gelek malper, dezgeh, kenal, û rûpelên Facebookê ew stran hate belavkirin.

Ciwanê Amûdê wisa jî got:" Strana min gelekî hate jê hezkirin, niha ez li ser yeka nû kar dikim, ew jî evînî ye, ji gotinê Şemal Seyda, û awazên Bavê Rewan in."

Hêja ye gotinê ku Ciwanê Amûdê, ku navê wî yê rastîn Ciwan El-Umerî ye, ji xelkên

Amûdê ye, pêlav-firoş e, ji zarokatiya xwe de ji hunerê hez dike, ji berî heyşt salan ve dest bi hunermendiyê kiriye, derdora deh stranan pêşkêş kiriye, hemû jî li ser welat û dijî koçberiyê ne.

Ji Filklorê Kurdî.. Kar Bi Aqiltî Xweş e!



Dibêjin du bazirgan li bajarê Mûsilê hebûn. Herdû bi hev nexweş bûn. Sibehkê yek ji wan hat li çayxanê rûnişt, dî ku berê bazirganê dî jî li çayxanê ye, yê pêşî ban yekî serserî kir û gote wî: Waye filan kes hat çayxanê dema bixwaze li ser kursiyê rûnê tu kursiyê ji bin bidî alî, wê bikeve û ez ê zêrekî bidim te.

Dema yê bazirgan hat k li ser kursiyê rûnê, yê serserî kursî ji bin kişand, mêrik bi qûn ve ket û ser xwe re nerî yê serserî nas kir. Yê bazirgan hat gilî kir; doza şeref û kerameta xwe kir heya emrê wî serserî bi şenqê anî.

Roja şenqê bazirgan hat û kursî ji bin lingê wî kişand û got:

Bira meriv wisa kursiyê dikşîne, ne wek te bi bêaqilî.

Herwekî Tîrêj gotiye:

Xwe parêz ke ji tiştên tewş û bê rê

Xwe nefroşe bi dînar û diravê

Hisabê mêran yê nekî ne mêr e

Bizan çûna bê tim sax ew ji avê.

(Ji pirtûka serpêhatiyên kurdan – Seydayê Tîrêj)

Ken Bi Kurdî Xweş e

Derew

- Te di wê bîrê de çi dikir?

Berî 30 salî se`eta bavê min ketibû vê bîrê, min jî îro derxist, tu tişt pê nehatiye, her wekî agir kar dike!

- Îcar ew çi ye! Ê min, bavê min berî 30 salî ketibû vê bîrê, me derxist hê jî sax bû!

- Errrik, çi derew!

- Na ne derew e. Çimkî bavê min di bîrê de saeta bavê te qurmîş dikir!

Dest Nedin Tirî...

Merovek li ser dikana meyfiroş zebeşekî digre û nîşanî meyfiroş dide û dibêje:

- Ma sêvên we yên herî mezin ev in? Meyfiroş jî dibêje:

- Ji kerema xwe re destê xwe pirr nede tiriyan wê biçimisin!

Bersiva Peyva Wendayî 54 : Cegerxwîn.

Peyva Wendayî

Peyva wendayî ji 7 tîpan e, merovê ji malbatê.

Dayik, bav, kur, keç, mam, xal, xaltîk, metik, dotmam, pismam, bapîr, bira, xwîşk.

Xaçerêz

Asoyî:

1- Şirovekarê helbestên Cizîrî.
2- Nivîsgeh (vajî), welatekî asyayê (vajî).
3- Awaza nivîskî.
4- Tersî stand (vajî), zaravekî Kurdî.
5- Ji bo cîwarê nêzîk, dewarê nêr (vajî).
6- Pakrewaneke Kurd, ji tilûran.
7- Evîndar jê hez dike.
8- Pisporê hendesê.

Sitûnî:

1- Taxeke Şamê.
2- Paşkîteke kirar, di dev de ne.
3- Viyan, mûyên rû.
4- Alava germkirinê (vajî), heman (vajî).
5- Axa li ber ba, zarok jê re bû (vajî).
6- Şêwe û cure (vajî), bêriyê (bê dengdêr).
7- Wekhev, Wekhev.
8- Nasnavê lehengê kela Dimdimê.

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	X	D	A	Y	I	K	D	M
2	A	B	K	X	M	K	O	A
3	L	I	U	A	V	E	T	M
4	T	R	R	L	A	Ç	M	R
5	Î	A	A	L	B	B	A	Î
6	K	X	W	Î	Ş	K	M	P
7	P	I	S	M	A	M	A	A
8	M	E	T	I	K	T	Î	B

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	N	A	■	K	U	R	I	K
2	■	W	E	K	■	O	D	E
3	R	A	Z	■	A	J	■	S
4	Î	K	■	Î	N	A	K	■
5	S	■	E	V	■	N	E	H
6	I	R	M	■	T	E	V	N
7	P	A	R	T	Î	■	O	K
8	Î	S	■	Î	R	E	K	■

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								■
2					■			
3		■					■	
4			■					
5				■		■		
6					■			
7	■		■				■	
8								